Ronahî

Şopdara Rastiyê ye

www.ronahi.net/ku/ Jimar :843 03-Adar- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan

www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com 423165

Bersiva jimara borî

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1	D	■	P	E	R	E	■	M	Î
2	A	X	■	C	A	N	Î	■	N
3	N	Î	Ş	E	■	E	N	Î	■
4	■	Ç	E	L	P	■	S	■	J
5	T	■	K	■	A	B	A	D	Î
6	R	E	■	E	Y	■	N	O	■
7	■	M	E	W	Î	J	■	T	A
8	I	R	Q	■	Z	■	K	I	Ş
9	R	■	D	A	■	Ş	Î	N	■

Xaçepirs



ÇEP-RAST

1. Alava ku datînin ser pişta hespan û li ser rûdinin... Ji pêncan yek zêde
2. Pêxemberek... Beşeke malê, jor
3. Dijberê rengê spî... Bajarekî me
4. Di zimanê zarokan de lêxistin... Dengdêrên "pêça"yê
5. Kurteya elementa hesin... Plakaya navneteweyî ya Îranê... Cînava pirsê ya ku tê wateya; li kû ye?
6. Nava rojê çêrandina pez heta danê êvarê
7. Kesê ku nezewiciye... Kesê ku deng naçiyê, kesê ku guhê wî nabihîze
8. Cure, celeb... Cînava şexsê sisiyan ji bo rewşa netewandî... Tevgera hewayê
9. Dar yan jî hesinê ku datînin ser stûyê ga ku pê erebe dikişandin yan jî cot dikirin... Cama mîkroskopê

JOR-JÊR

1. Sewaleke çirik û çîpên wê pir dirêj... Kurtebêja zêr
2. Bi soranî 'av'
3. Têbînî... Banga ji bo nimêjê
4. Meha pêşî
5. Paytexta Sûriyê... Kesê ku rê nîşan dide
6. Nexweşiyek
7. Ji bo sekinandina ker, hesp û hestiran... Kurteya Koma Civakên Kurdistanê
8. Kurteya ajansa fermî ya Tirkiyê... Qumaşê ku ji hiriyê çêdibe
9. Bersiva pejirandinê, erê... Afirandina şanoyê ya dilpêşewitîn û pêkenîn bi hev re

Quncika têgînan

Biryar	Li ser kirina tiştekî yan awayê kirinê bijartin, ferman, yan li hevkirin. Qerar
Biryardarî	Israr, israra di biryarê de
Erk	Tişta ku divê kesek bike. Wezîfe, peywir: Parastina welat erkê me tevan e.
Erkdar	Kesê bi karekî hatî wezîfedarkirin. Wezîfedar.
Maf	Tişta ku qanûn yan jî çanda civakekê rê didinê ku bê kirin. Heq: Azadî mafê her kesî ye.
Mafdar	Kesê ku mafê kirina tiştekî jê re heye. Xwedîheq: Ez di gotina xwe de mafdar im.
Polîtîka (Îtalî)	Diyarkirina pirsgirêkan û çareserkirina wan. Siyaset
Rewşenbîr	Kesê di mijara çand û civakî de jîr, zana û têgihiştî. Ronakbîr, entelektûel
Sîvîl (Fransî)	Kesê ne leşker. Medenî
Wane	Demek ya fêrbûnê. Ders

Pêngava duduyan ya Keziyên Kesk

Darîn Silê/Qamişlo

Yek ji karên herî girîng û herî pêwîst şînkirina derdor û çandinî ye. Çimkî bingehê jîngehê yê yekê ye. Di Heman demê de bedewiyê dide xwezaya jiyanê û qirêj û tozê jî kêm dike. Bi vê hişmendiyê li Qamişlo pêngava duduyan ya bi navê "Keziyên Kesk" dest pê kir.

"HER KU DIÇE NEXWEŞÎ PIRTIR DIBE"

Derbarê mijarê de endamê Keziyên Kesk Mehmûd Çeqmaq wiha axifî:" Ji ber ku herêma me herêmeke petrolê ye, zerer digihe xwezayê û gelek nexweşî çêdibin. 80% nexweşên penceşêrê ji milê Cizîrê ne. Çimkî cihê şîntayî lê kêm be û xweza qirêj bibe, nexweşî jî lê pir dibe. Ji bo wê me dest bi projeyeke wiha kir. Despêkê hin nîqaş hatin kirin, lê di encama nîqaşê de me biryara projeyeke bi navê "Keziyên Kesk" da. Îlona 2020an me dest bi projeyê kir. Komîteya me ya zanistî jî heye. Projeya me wê nêzî pênc salan dewam bike. Niha em di pêngava duduyan de ne. Despêkê em axê dixin kîsan, pişt re daran diçînin." Mehmûd Çeqmaq axaftina xwe wiha qedand: "Piraniya daran yên fêkî ne (Tirî, Hejîr, Hinar û hwd). Gelek sazî û şerîkeyan cihê xwe di projeyê de girtine. Ji bo dagirtina kîsan jî her roj saziyek bi me re dibe alîkar. Xwendekarên Zanîngeha Rojava jî alîkariya me dikin. Armanca me ji vê projê ew e ku civak li xwezaya derdorê xwedî derkeve. Ev jî ji bo jiyaneke xwezayî ye. Proje ne ya me tenê ye, projeyeke civakî û çandî ye. Ji bo wê em bi hêvî ne her kes beşdarî bibe û alîkariya me bike."

"WÊ NÊZÎ DU MILYONAN DAR WERIN ÇANDIN"

Endezyarê çandiniyê Ferhat Reşîd Îsa li ser projeyê wiha axivî: "Ez li vir çavdêriyê dikim û di çandina daran de jî dibim alîkar. Ev proje wê di milê xwezaya herêmê de guhertineke pir mezin çêke. Herwiha çanda civakê jî xurtrir dike. Darên em diçînin li gorî hewaya herêmê ne. Wê nêzî du milyonî dar werin çandin. Em bi hêvî ne civak bi me re alîkar be. Çimkî proje ji bo civakê hatiye danîn."

Tûrikê çîvanokan

Di tûrikê me de îro peyvên xweş yên li ser lîstik û baranê hene

Berê dema baran nedibariya, zarok derdiketin derve Bûka Baranê çêdikirin. Di ber re jî tevan bi hev re ev gotinên li jêrê digotin:

Baranê bibar bibar.
Çivîkan genimê te xwar.
Zarokan nanê hişk xwar.
Sêwiyan serê hev xwar.

Di lîstikeke din de zarokan kefa destê xwe didan erdê û tiliyên hev dijimartin. Bi jimartinê re jî ev gotinên li jêrê digotin:

Hêklo mêklo. Çarim çêklo.
Hestiyê kewê. Ber bêderê.
Kew firî. Mamo dirî.

Divê em şoreşa jinê berfireh bikin

Rêber Abdullah Ocalan di 8'ê Adarê Roja Jinan a Cîhanê ya sala 1998 'an de ji MED TV re ev nirxandin kiriye. *R-4*

HBDH: Kesên deriyê xwe li we vekirîn bêbextiyê li wan nekin!

HBDH'ê bal kişand ser karên sîxurkirin û nokeriyê yên dewletê û hişyarî da nokeran, sîxuran û îtirafkaran; "Bêbextiyê li kesên ku deriyên xwe li we vekiriye nekin. Hestên baweriyê yên gel bi xiyaneta xwe gemarî nekin." *R-2*

Ronahî

Şopdara Rastiyê ye

www.ronahi.net/ku/ Jimar : 843 03-Adar- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Ji bîrkirin xîyanet e

Dibêjin eşq pir zor e û ti heşt û hel-west nikarin bînin ziman. Li bakur û rojhilatê Sûrî ji 9ê Cotmeha 2019an ve piştî dagirkirina Serê Kaniyê ge-lek ciwan bi agirê eşqa welatê xwe dişewitîn û ti tiştî nikarî kela volkana dilê wan vemrîne.*R-3*

DU HÎTLER YÊK MEJÎ

Hîtler piştî ku rêveberî tev xist destê xwe hêza dewletê tev ji bo şer û qirkirinê bi kar anî. Ji bo Hîtler ti nirxên mirovî û exlaqî ne girîng bûn. Rexne û şiyariyan ti bandor lê nekirin. Bi hêzê bawer dikir û her tim hêz bi kar anî. Gotin, qanûn tev kirin parçeyên hêzê û xizmeta şer. Di dawiyê de bû sedema hilweşîna dîrokî ya herî mezin ya dinyayê. Enceq bi şkandina hêzê hat sekinandin. Niha rêveberiya Tirkiyê jî di heman rewşê de ye. *R-5*

Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî bang li PDK`ê kir ku rojnamevanên Behdînа berde

Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî (Amnesty International) di derbarê girtiyên Behdînanê yên di girtîgeha Hewlêrê de nameyek ji hikumeta Başûrê Kurdistanê re şand û bang kir rojnamevanên ku hatine girtin, berdin. *R-5*

Şêniyên Hesekê û Çilaxa şehîdên meha Sibatê bîr anîn

Şêniyên bajarê Hesekê 152 şehîdên meha Sibatê bîr anîn. *R-2*

Bi wêneyên pekrewanan 'Baxçeyê Şehîdan' dixemilîne

Ji bo eşke-rekirina heşt û helweştan gelek rê û rêbaz pêwîst in. Bavê Kor-do, ji bo bikare van heştan derxe holê û berxwedana şehîdan ji her kesî re ragihîne, bi awayekî profesyonel wêneyên pekrewanên Kurdistanê xêz dike. *R-7*

HBDH: Kesên deriyê xwe li we vekirîn bêbextiyê li wan nekin!

HBDH'ê bal kişand ser karên sîxurkirin û nokeriyê yên dewletê û hişyarî da nokeran, sîxuran û îtirafkaran; "Bêbextiyê li kesên ku deriyên xwe li we vekirine nekin. Hestên baweriyê yên gel bi xiyaneta xwe gemar nekin."

Komîteya Rêveber a Tevgera Şoreşger a Yekbûyî ya Gel (HBDH) têkildarî kesên ku destê wan ketiye xwîna gel û şoreşgeran daxuyaniyek ji bo hişyarkirinê da.

Di daxuyaniyê de hate ragihandin ku sîxurî û îtirafkarî yek ji polîtîkayên rêk û pêk ên dewleta Tirk a faşîst e û hate gotin, "Dewleta Tirk a faşîst û hêzên wê yên ewlekariyê, ji bo sîxurekî, nokerekî ber bi aliyê xwe ve bikişîne, tiştekî ku neke, rêbazeke ku neceribîne nîne."

Di daxuyaniyê de hate destnîşankirin ku dijmin bi çi rengî derkeve pêşiya wan, hêza wan a herî xurt, baweriya bi gel û têkoşînê re ye û hate gotin, "Yên ku kêliya xwe, roja xwe bi şoreşgerî derbas dikin; yên ku hevrêtî, şoreşê û hezkirina gel di dilê xwe de hildigirin, li dijî dijmin dibin mîna kelehê. Her milîtanên ku hêza xwe ji vir digirin û durustiyê ji xwe re dikin esas, xwedî îradeya ji pola ne ku dikarin her cûre rêbazên şerê taybet têk bibin. Her milîtanê dikeve destê dijmin, gotineke bi tenê ya ku kêfa dijmin bîne û zerarê bide nirxên me yên şoreşgerî nabêje, agahiyeke biçûk jî nade. Helwesta me divê bêdengî be û dilsoziya bêdawî ya bi doza azadiyê ya gel re be.

Gotina me ji wan kesan re ye ku ji qadên şoreşgerî qut bûne, hevkariyê bi hêzên ewlekariyê yên faşîst re dikin û destê wan ketiye xwîna gelên me û şoreşgeran. Ji bo berjewendiyên xwe yên şexsî xwînê nerijînin sifra gel, bêbextiyê li mirovên deriyê xwe li we vekiriye nekin. Hestên baweriyê yên gel bi xiyaneta xwe qirêj nekin. Werin teslîmî hêzên Tevgera me ya Şoreşger a Yekbûyî ya Gelan bibin. Li şûna ku hûnê tevahiya jiyana xwe bi rengekî bêrûmet dewam bikin û heta kêliya dawî bi tirs bijîn, werin teslîmî edaleta me ya şoreşgerî bibin.

Hêzên me yên şoreşger, wê rojekê teqez, ji bo 'silava Laz Kemal û şoreşgerên ku destê we ketiye xwîna wan, bigihînin' wê li deriyê sîxur û nokeran bixin û edaleta şoreşgerî teqez nîşan bidin." anf

Koalisyona Navneteweyî wê girtîgeha li Hesekê ya DAIŞ`î tê de, fireh bike

Koalisyona Navneteweyî ya bi pêşengiya Emerîka ragihand ku niyeta wan heye girtîgeha li bajarê Hesekê ya çeteyên DAIŞ`ê lê dimînin, berfireh bikin û wê Brîtanya vî projeyê finanse bike.

Cîgirê fermandarê Koalisyona Navneteweyî general Kevin Copsey ji malpereke emerîkî re got, wê girtîgeh bi qasî du qatan were firehkirin ku girtîgeh ji 3 avahiyan pêk tê û nêzî 5 hezar girtiyên DAIŞ`î tê de ne.

Berdevkê Wezareta Parastinê ya Brîtanya got, wê welatê me xebata berfirehkirinê fînanse bike.

Hin berpirsên leşkerî hişyarî dabûn ku wê Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) nikaribe girtîgehan heta hetayê biparêze û gotibûn, çekdarên xwedî tecrûbe dibe ku ji wan avayiyan birevin û careke din tev li şer bibin. Lêbelê xuya ye ku koalisyon piştgiriya girîtgeha Hesekê ku bi DAIŞ`iyan dagirtî ye, çareya herî baş dibîne.

General Paul Calvert ku bi wê yekê hatiye erkdarkirin, got armanc ew e ku Hêzên Sûriya Demokratîk bi awayekî baştir kontrola wan avahiyan bikin. Calvert diyar kir ku dema niha û tevî ku QSD`ê carna dikeve girtîgehê da ku telefonên destan û tiştên din yên hatîn derbaskirin, desteser bike. Lêbelê ji ber dagirtîbûna girtîgehê li gorî hejmara nobedarên wê dihêle ku çalakiyên bi vî rengî pir kêm û xeternak bin.

Calvert di hevpeyvînekê de li navenda Koalisyona Navneteweyî ya

li Bexdayê roja Sêşemê gotibû, bi firehkirina girtîgehê re wê girtî bi rêjeyeke mezintir bên belavkirin, ji bo ku li hundir torên çeteyan neyên avakirin."

Berdevkê Wezareta Parastinê ya Brîtanya bi daxuyaniyekê diyar kir ku proje di çarçoveya hewldanên koalisyonê yên pêkanîna istiqrarê li herêmê de, pêk tê.

ANHA

Rûsya têkildarî ketina helîkoptera xwe daxuyanî da

Rûsyaya têkildarî ketina helîkopetera xwe ya li Til Temir got, helîkopter ji ber sedemên teknîkî neçar ma dakeve û tiştek bi taximên wê nehatiye."

Wezareta Parastinê ya Rûsya bi daxuyaniyekê diyar kir ku roja Yekşemê dema helîkopetereke wan li asîmanê herêma Til Temir ya gundewarê Hesekê digeriya

bûyer çêbûye. Herwiha da zanîn ku leşkerên di helîkopterê de dimildest veguhestine balafirxaneyê û xeter li ser jiyana wan nîne.

Wezaretê ragihand ku li ser leşkerên di helîkopeterê de ti êriş çênebûne.

Li gorî agahiyên çavkaniyan dayîn ANHA, helîkoptereke Rûsyayê di navbera gundê El-Rêhaniyê û El-Qasimiyê yên li bakur rojavayê navçeya Til Temir ya kantona Hesekê de ket xwarê û 3 leşkerên wê birîndar bûn.

Şêniyên Hecînê şehîdên meha Sibatê bîr anîn

Şêniyên gundewarê rojhilatê Dêrezorê 5 şehîdên di pêngava Bagera Cizîrê ya rizgarkirina Dêrezorê ya Sibata 2018'an de şehîd bûyîn, bîr anîn.

Meclisa Malbatên Şehîdan ya bajarokê Hecînê bi beşdariya malbatên şehîdan, fermandarên leşkerî û Meclisa Gel û hevserokên wê merasima bîranînê bi rêxistin kir.

Şehîdên hatî bîranîn yên Hêzên Sûriya Demokratîk ev in: "Cemal Ebdullezîz, Lorans El-Şecîf, Amir El-Ibêd, Hemûd El-Henzal û Emaş El-Elî."

Merasima bîranînê bi deqeyek rêzgirtinê dest pê kir. Piştre rêveberê nivîsgeha şehîdan ya Meclisa Dêrezorê ya Leşkerî, Şemlan El-Mixlêf axivî û wiha got: "Fedakariya şehîdên me ji bo parastin û rizgarkirina welat kirîn, hêz û îradeya me xurttir kir. Wê her tim ji bo gelên azadîxwaz bibin ronahî."

Di dawiya merasimê de malbatên şehîdan li ber wêneyên şehîdan find pê xistin.

ANHA

Şêniyên Hesekê û Çilaxa şehîdên meha Sibatê bîr anîn

Şêniyên bajarê Hesekê 152 şehîdên meha Sibatê bîr anîn.

Meclisa Malbatên Şehîdan ya bajarê Hesekê merasima bîranîna 152 şehîdên meha Sibatê yên şoreşa rojavayê Kurdistanê û bakur û başûrê Sûriyê li dar xist.

Merasim li goristana Şehîd Dijwar ya li gundê Dawidiyê yê Hesekê hat li darxistin. Bi sedan malbatên şehîdan beşdar bûn.

Di merasimê de endamê Meclisa Malbatên Şehîdan Ehmed Esad got, şehîdên me ji bo azadî û rûmeta gelên bakur û rojhilata Sûriyê canê xwe feda kirin û hêrêmên me ji çeteyên DAIŞ'ê rizgar kirin."

Bi navê Meclisa Leşkerî ya Hesekê fermandar Remedan Badînî jî got, bi saya şehîdan me gelek destkeftî bi dest xisitn. Gelên bakur û başûrê Sûriyê ji bo jiyaneke aram û ewla canê xwe feda kirin."

Merasim bi durişmên "Şehîd namirin" bi dawî bû.

Li Çilaxa jî Meclisa Malbatên Şehîdan ji bo bîranîna 19 şehîdên meha Çile û Sibatê de li cihên cuda şehîd bûyîn, merasimek li dar xist.

Di merasimê de hevserokê PYDê Enwer Mûslim got, bi saya şehîdan em hene. Ew şehîd bûn da ku em di ewleyiyê de bijîn. Piştre li ser berxwedan û lehengiya şehîdan sînevizyonek hat pêşandan û wêneyên şehîdan tevî nasnameyên wan radestî xizmên wan hatin kirin.

Merasim bi durişmên dilsoziya bi şehîdan re bi dawî bû.

ANHA

Baxçeyê şehîdan bi xêzkirina wêneyên wan dixemilîne

Ji bo eşkerekirina hest û helwestan gelek rê û rêbaz pêwîst in. Bavê Kordo, ji bo bikare van hestan derxe holê û berxwedana şehîdan ji her kesî re ragihîne, bi awayekî profesyonel wêneyên wan xêz dike.

Jiyan BOZO/Qamişlo

"DIVÊ PÊNÛSA BIRAYÊ MIN LI ERDÊ NEMÎNE"

Derbarê mijarê de Mehfûz Ehemed Yûsiv (Bavê Kurdo) wiha axivî: "Ez ji Dêrika Hamko me lê niha li Lubnanê dimînim. Du kur û keçeke min hene. Hevjîna min jineke pir fedekar û zana ye, bi min re pir dibe alîkar. Sala 1991ê em hatin Qamişlo. Li wir di 7 saliya xwe de min dest bi xêzkirina wêneyan kir. Ez ji xêzkirina wêneyan pir hes dikim. Birayê min şehîd Elî ez fêr kirim. Ji bo ku pênûs û rêngên şehîd Elî li erdê nemînin min xwe pir pêş xist. Çûna wî ya çiyê (1992) bandoreke mezin li min kir. Rojekê jî ji xeyalên min qut nebû. Min heta refa 4an xendiye. 1995an stirana Hebsa Diyarbekir pir bala min dikşand û pir biêş bû. Êdî min nikarî kurdîtiyê ji xeyalên xwe qut bikim. Ji ber rewşa aborî ez ji dibistanê derketim. Bi wî temenê xwe yê piçûk min her kar kir. Li Qamişlo sê ciyên xêzkirina wêneyan hebûn. Lê mixabin gelek caran ez diqewitandim. Lê her ku diçû xwesteka min pirtir dibû. Çimkî min tim digot divê pênûsa birayê min li erdê nemîne. Di malbatê de bav û xwîşka min jî wêneyan xêz dikin."

"EZ ŞÎRÊ XWE LI TE HELAL NAKIM"

Mehfûz Ehemed Yûsiv axaftina xwe wiha domand: "Bi rastî em çi bikin em nikarin mafên şehîd û malbatên wan bidin. Çimkî ti tişt nikare hestên min bîne ziman. Ji bo ku bikarim şehîdên şoreşê bîr bînim min dest bi xêzkirina wêneyên wan kir. Çimkî gelek malbatan gazind dikirin, digotin, çima zarokên me jî nayên bîranîn. Min xwest bi wêneyên xwe ji wan re bibim bersiv. Ji bo pêkanîna xwesteka dayîka xwe min ev kar bi hostetî kir. Ji ber wê îro bi hezaran dayîkên min hene. Dayîka min her tim digot, ku tu wêneyên şehîdan bi pereyan çêkî ez şîrê xwe li te helal nakim. Ji ber wê min soz dayê ku heta sax bim wêneyên şehîdan tavan çêkim."

"EŞQ Û DÛRBÛNA JI WELAT PIR ZOR E"

Mehfûz Ehemed Yûsiv bi van gotinan axaftina xwe bi dawî kir: "Ji bo wê min cara yekê wêneyê şehîdekî ji Efrînê xêz kir û min ji wir li ser rûpelê xwe ya fecbokê yê bi navê Bavê Kurdo Baxçê Şehîdan weşana zindî vekir. Ez rojane wêneyên pakrewanan xêz dikim. Dilê min wiha şad dibe û dayîk û birayê xwe jî bîr tînim. Ez çar saetan weşana zindî vedikim û gelek malbatên me yên welatparêz jî tevlî dibin. Ez sicîla şehîd bi gîştî û ciyê şehadetê datînim û dest bi xêzkirênê dikim. Ji bo belgekirina lehengiya van pekrewanan çi ji destê min bê ezê bikim. Ezê di demeke nêzîk de vegerim Rojava. Çimkî ez êdî nikarim li vir bijîm. Eşq û dûrbûna ji welat pir zor e. Careke din soza xwe nû dikim ku ezê heta nefesa xwe ya dawiyê şopdarê van qehremanan bim."

Her qada civakê dika şanoger e

Leylan RESO/Qamişlo

Bijîşk mirovên nexweş derman dikin, lê şanoger bijîşkên civakê ne. Ciwanên bakur û rojhilatê Sûriyê tevî zor û zehmetiyên kar, xebata xwe ya hunerî pês dixin. Li Hilala Zêrîn ya li bajarê Qamişlo, ji bo paşroja şanoyê ciwan tên perwerdekirin.

"EZ JI KARÊ ŞANOGERIYÊ PIR HES DIKIM"

Şanogera Hîlala Zêrîn Beraa Hesen li ser xebat û jiyana xwe wiha axivî: " Temenê min 20 e. Ez ji bajarê Terbespiyê me. Ev 3 sal in ji bo şanogeriyê li Qamişlo bi cî bûme û çar sal in karê şanoyê dikim. Ji karê şanogeriyê pir hes dikim. Bavê min jî şanoger bû. Min meraq kir fêm bikim ka çi dike û karê şano çawa ye. Ji ber wê her ku min karê wî didît hestê fêrbûnê bi min re çêdibû. Berî şoreşê kom tev veşartî bûn, komên Newrozan tenê derdiketin. Piştî şoreşê koma me ava bû. Karê şano ne hêsan e. Çimkî ji fêrkirina emûreke teknîkî cudatir e."

"DI DILÊ HER JINÊ DE HUNER HEYE"

Beraa Hesen di dewama axaftina xwe de ev nirxandin kir: "Şanoger dikare bikeve rola her kesê di civakê de. Çimkî gel keyfxweşî, êş, bêçaretî, pirsgirêk û şiyarkirin di şanoyê de derdikevin. Herwiha rola siyastmedar û bijîşkan jî dilîzin. Di dilê her jinê de huner heye. Yên çand û huner parastîn jin in. Lê ew jî nakevin ferqê ku ewqas eşqa hunerê di dilê wan de heye. Hin jin hê guh didin civakê û xwe di qalibê çewisandî de dihêlin. Hêvî dikim ku her jin hunera hundirê xwe bêtirs û bêserm derxe."

Gundê Nêf

Hediya HISÊN/Qamişlo

Gundên herêma Cizîrê xwediyên dîrokeke dirêj zengîn in. Gelek gundên kevnar ku dîroka wan digihîje serdemên cuda li Cizîrê hene. Yek ji wan gundê Nêf e. Li gorî şêniyên gund temenê avakirina gund digihîje 84 salî.

Sala 1934. gundê Nêf hatiye avakirin. Bi dûrahiya 13 Km. li rojavayê bajarê Qamişlo dikeve. Du malbatên binavûdeng (malbata Hisênê Salih û Têlo) gund ava kirine. Dem gund ava dikin di nava axê de kevirekî dibiînin. Li ser kevir nivîsa "Mixtarê Nêf" hatiye nivîsîn. Ji ber wê navê gund dikin Nêf.

Derbarê mijarê de dayîka bi navê Kesûma Ehmedo wiha axivî: "Gundê Nêf gundekî kevnar e. Dîroka wê digihe 84 salî. Di gund de 35 mal, dibistan û komînek hene. Sala 1967an di navbera gundiyan û rêjima Beasê de şer derket. Sedema şer jî rêjima Beasê dixwest erdê Kurdan bide Ereban. Ji zarok û zilamên bitemen nêzî 50 kesî hatin girtin. 41 rojî di zindanê de man.

"ZEMANÊ BERÊ JI NIHA XWEŞTIR BÛ"

Sibehan zû em ji xew radibûn. Karê me anîna avê ji bîrê bû. Piştre ji jinên gund li ser tenûrê kom dibûn; hem nan lê dixistin hem suhbet dikirin. Karê gund pir bû, bi teybetî payîzê û serê zivistanê. Amadekirina xwerek, seyandina xaniyan diviya ev giş berî zivistanê biqedin. Çandinî û şivantî zilaman dikir û karê malê yê jinan bû. Şahiyên me 7 rojan dom dikirin. Serê sibehan zû radibûn govend digerandin heta dibû êvar. Roja heftan bûk ji mala bavê wê derdixistin. Piştî ku karê me diqediya her êvar jinên gund li malekê civat digerandin. Zilam jî li mizgeftê diciviyan. Mala cihnivînên wê pir bûna ji malmezinan bûn. Lê niha dem hatiye guhertin. Li gund mal zêde bûne lê gundî ne

Heskirina wî ya mûzîkê hunera kurdî zindî kir

Dilîn EHMED/Qamişlo

Her hunermend di temenekî de hestên hunerê di dilê wî de lê dixin. Hunermend Seîd Yûsiv jî di temenekî piçûk de huner û hestên wî de dijene û wê piştre ji bo hunermendên rojavayê Kurdistanê bibe çavkanî.

Hunermend Seîd Yûsiv 10ê Nîsana 1947an li taxa Qidûrbeg ya bajarê Qamişlo, ji dayîk bûye. Di sala 1966an de bavê wî Tembûrekê bi 13 kaxizên Sûrî dikire û riya hunerê jê re vedike. Di heyama du salan de bênavber Seîd Yûsiv stiranên Kurdî li ser wê sazê çêdike. Stirana xwe ya yekê (ji gotin û awazên wî) "Eman Neman Cîhan" sala 1967an dibêje. Piştre re ew stiran navdar dibe û ji hêla hunermend Şivan Perwerer ve jî tê gotin. Hunermend Seîd wê demê berê xwe dide Lubnanê û li wir Koma Newroz ava dike. Seîd Yûsiv herwiha ji hunermenda navdar Semîra Tewfîq re jî awaz çêkiriye.

NAVÊ "MÎRÊ MÛZÎKÊ" LÊ HAT KIRIN

Hunermend Seîd Yûsiv dibêje; hunermendê binavûdeng Ferîd El-Etreş û mûzîkjenê navdar Ferîd Xisin ji min re bûn bingehê awazjeniyê. Mîrê Bizqê yê Ereb yê navdar Mihmed Ebdulkerîm dibêje, Seîd Yûsiv piştî min bûye "Mîrê Bizqê" û dixwaza bizqa wî ya taybet ji Seîd re bê diyarîkirin. Lê gelo wê Seîd Yûsiv piştî xwe vî navî bide kê. Ew wiha dibêje: "Hê min kesek nedîtiye ku navê xwe bidimê. Lewre mîrekî daye min, pêwîst e ez jî bidim hunermendekî jêhatî."

"WÊ DÎROKA BEHSA BAVÊ MIN BIKE"

Keça hunermend Seîd Yûsiv Şebal Seîd Yûsiv, di bîranîna wî de wiha axivî: "Destpêkê dixwazim bêjim bavê xwe, keçên te bîriya te kirine. Bavê min Seîd Yûsiv bi hezaran stiran ji gotin û awazên xwe çêkirine. Wî hunera kurdî zindî kir. Ji ber ku stiranên bavê min her tim bi demê re bûn, ji 55 salî heta roja îro xelk lê guhdarî dikin. Ne ji ber ku bavê min e ez wiha dibêjim, Seîd Yûsiv bingehê mûzîka gelê Kurd e. Hêvî û daxwaziya wî her tim ew bû ku xaka Kurdistanê azad bibe. Ji wiha zêdetir ez behsa wî nakim, lewra wê dîrok behsa wî bike."



bi deng û awazên xwe, di hiş û dilê me de, zindî bimîne. Ji bo pêşxistina çand û hunera gelê xwe, emê li ser şopa hunermendên mîna Seîd Yûsiv bin. Çimkî em ji heskirina wan ya mûzîkê, moral digirin. Di dawiyê de ji malbata wî û gelê Kurd re sersaxiyê dixwazim."

gundiyên berê ne."

"Di pêşîgirtina madeyên hişbir de rola malbatan girîng e"

Welaiyên bakur û rojhilatê Sûriyê gotin, di parastina civakê ji diyardeyên neyînî û di serî de madeyên hişbir de rola malbatan pir girîng û sereke ye. Ji ber wê divê di navbera malbatan û Hêzên Ewlekariya Hundir de hevkarî hebe.

Madeyên hişbir ji nexweşiyên herî xeternak yên li hemberî civakan in. Lewre bandoreke neyînî li ferd, malbat û civakê dikin. Herwiha belavbûna wan li ser ewleyî û aramiya civakan xeter e. Ji bo bidawîkirina vê diyardeyê Hêzên Ewlekariya Hundir yên bakur û rojhilatê Sûriyê di nava tevgerê de ne.
25'ê Îlona 2020'an Hêzên Ewlekariya Hundir bi ser ciyê kesên madeyên hişbir difirotin de girtin. Li gorî welatiyan, bê rola malbatê xebata hêzên ewlekariyê têrê nake.
Girêdayî mijarê, welatiya bi navê Gulnaz Ferhan Hisên ya ji Qamişlo diyar kir ku keda Asayişê têrê nake. Lewre bê perspektîf û şîretên dê û bavan ti kes nikare vê çareser bike û vê nexweşiyê têk bibe û wiha got: "Rola dê û bavan di vê yekê de mezin e. Eger her yek ji me nifşekî zana û bi tendurist ava bike, wê demê

emê vê diyardeyê têk bibin."
Li cîhanê rêjeya bikaranîna madeyên hişbir zêde dibe. Li gorî rapora nivîsgeha NY ya girêdayî hişbir û sûcan ku 25'ê Hezîrana par de weşandiye, rêjeya bikaranîna hişbirê di sala 2020'an de li gorî salên borî ji sedî 30 zêdetir e û zêdetirî 35 milyonî mirov ji ber vê yekê êşî dikişînin.
Hêzên Ewlekariya Hundir hefteya borî bi daxuyaniyekê ragihand ku oprasyonên ewleyiyê yên têkoşîna li dijî hişbirê berdewam in, herwiha got, di operasyonê de 109 kes hatine girtin. Ji wan kesên girtî 17 jin in ku bazirganên hişbirê ji bo belavkirina hişbirê ew bi kar dianîn.
Ezîz Elî yê ji Kobanê diyar kir ku pêwîst e parastina civakê ji hundirê malbatê ve bê kirin û wiha got: "Hêzên Ewlekariya Hundir erkên xwe yên ewleyî û aramiyê pêk tînin. Lê heke asta zanabûnê ya malbatan têrê neke, wê demê Hêzên Ewlekariya Hundir nikarin bi tena xwe parastina civakê bikin."
Elî destnîşan kir ku rola malbatê di avakirina civakê de bi rêya avakirina nifşekî zana û gihandî mezin e. Lê heke di malbatê de zanakirina durist neyê kirin, ew yek dê bandoreke neyînî li civakê bike û dê bi xwe re hilweşîne.

Li aliyekî din jî Luqman Îsa yê ji Serê Kaniyê ya dagîrkirî axivî û got, malbat di civakê de şaneya piçûk û ya herî sereke ye û rola wê di avakirina civakê de girîng e û wiha got: "Divê her kes alîkariya Hêzên Ewlekariya Hundir ya têkoşîna li dijî hişbirî û pêşdeçûna civakê bike."

ANHA

Sûka sergirtî ya Minbicê bûye navenda tevgera bazirganiyê

Sûka sergirtî ya Minbicê ji ber ku tê de pêdiviyên cuda bi nirxên baş peyda dibin, bûye ciyê bikiran û bazirganên herêmên cuda yên bakur û rojhilatê Sûriyê.
Sûka sergirtî ya Minbicê ango "Sûka Gelerî" ji girîngtirîn û kevntirîn sûkên li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê ye. Rojane gelek bikir û bazirgan berê xwe didinê. Herwiha gelek pêdiviyên bi bihayê guncew peyda dike. Ji ber wê li ser asta bazirgazî û aborî xwediya girîngiyeke mezin e.
Li gorî hinek çavkaniyan, sûk sala 1885`an hatiye avakirin. Rûbera wê fireh e û gelek dikan bi awayekî endezyarî bi hev ve hatine girêdan. Hinek bi çimento hatine girtin û hinek jî hesin li ser hatiye girtin.

TEVGERA BAZIRGANÎ JI BERÊ VE ÇALAK E

Ji ber cihê bajarê Minbicê yê stratejîk ku gelek herêmên bakurê rojhilatê Sûriyê bi bakur rojavayê wê ve girê dide, tevgera bazirganî tê de nasekine. Ev jî taybetmendiyên ku li derekê din peyda nabin, dan bazirganiya Minbicê.
Niha Minbic dergehê herêmên nakur û rojhilatê Sûriyê ye. Tê de 3 dergehên sereke hene ku herêmên Rêveberiya Xweser bi herêmên din ve girê dide. Dergeh ev in; Um Cilûd li bakur rojavayê bajêr, Ewn Dadat li bakur û Taîhe li rojavayê bajêr.
Peydabûna ewlehiyê hîmek din e ku bandor li tevgera bazirganiyê dike. Nexasim ku li sûka sergirtî ku xwe bi xwe ava kir û bû meqseda gelek bazirgan û bikirê herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê yên cuda. Derbarê mijarê de cîgirê hevserokatiya Komîteya Aborî ya Minbicê Cemîl Mihemed ji ANHA re axivî û wiha got: "Sûk bi şêniyên bajêr,

gundên wê û herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê yên cuda qerebalix e. Tê de tevahiya pêdiviyên welatiyan peyda dibin."
Mihemed wiha domand: "Ji bilî bazareke taybet ji bo zêran, dikanên caw, cilên hazir, madeyên xwarinê û beşek taybet a pêlîstok û xişiran hene."
Mihemed diyar kir ku sûk berê bi firotina hevrîşm, caw û nalên hespan navdar bû ku ji wir karwanên bazirganiyê ber bi Iraq û Tirkiyê ve dest pê dikirin. Herwiha ji wir karwanên hec jî dest pê dikirin.

KEVNAR E Û HÊ MEQSEDA GELEK BAZIRGAN Û FIROŞKARAN E

Li nava Sûka Sergirtî li aliyê bakur

mizgefta mezin heye. Ev mizgeft hemwextî avakirina sûkê hatiye avakirin. Li aliyê rojavayê wê jî, hemam heye. Beriya aloziya Sûriyê ya 2011`an, bûbû meqseda turîstan.
Sûk dişibe sûkên din ên li Heleb û Şamê û teşeya avahiyên wê heman in.
Hisên El-Xenaimî xwediyê dikanekê li sûkê ye têkildarî mijarê wiha axivî: "Sûk berê bi navê Sûka Ukaz dihat naskirin. Minbic li ser riya Herîr bû ya ku ji Çîn û Hindistanê dihat û diçû welatên rojavayî. Bazirgan li Minbicê vedihesîn û piştre rêwîtiya xwe temam dikirin."
Hisên destnîşan kir ku sûk destpêkê sala 1885`an tenê 5 dikan bûn. Piştre sala 1916`an fireh bû. Sala 1994`an bazirganên sûkê, zemîna wê bi mermerê dûz kirin û niha tê de zêdetirî 650 dikan hene.

ANHA

"Li milekî koçberî li milê din astengdarî"

Darîn Silê/Qamişlo

Di jiyanê de gelek astengî hene, lê her astengî bi rengekî cuda bandorê dike. Ku yek ji wan jî astengiya bedenê ye. Bandora van astengiyan di koçberiyê de girantir dibe. 9ê Cotmeha 2019an ji ber êrişên dewleta tirkî yên ser Serê Kaniyê bi dehhezaran malbat neçarerî koçberiyê bûn ku me di nava wan de gelek kesên astengdar dîtin.

"BI ŞEV Û ROJ EZ BI WAN VE MIJÛL IM"

Derbarê dagîrkirina Serê Kaniyê û koçeriyê de welatiya bi navê Edle Zêf Cezaa ya ji Serê Kaniyê wiha axivî: "Piştî dagîrkirina bajarê me, em neçarî koçberiyê bûn. Despêkê em çûn Hesekê, lê rewşa me li wir jî ne baş bû. Ji ber wê em hatin Amûdê, di xaniyê kirê de bi cî bûn. Kiriya xanî 125 hezarê Sûrî ye. Rewşa me ya aborî pir xerab e. Hemserê min li şaredariyê kar dike û fonê wî 200 hezar e, lê têra me nake. Ji ber wê ez neçar bûm kar bikim. Ez li malan karê baqijiyê dikim. Pênc keçên min hene, sisê ji zikmakî astengdar in. Yek 12, yek 4, ya mezin 13 salî bû lê berî sê salan ew mir. Doktor dibêjin astengiya wan di mejî de ye. Lê heta niha ti çareserî nehatiye dîtin. Bi şev û roj bi wan ve mijûl im. Çimkî nikarin pêdiviyên



xwe pêk bînin, ez bi destê xwe xwarinê didim wan. Jixwe ya piçûk nikare hereket jî bike. Ji ber ku ez wan hiltînim û datînim, di pişta min de dîsk çêbûye. "

"JIYANA MIN PIR BIÊŞ E"

Edle Cezaa axaftina xwe wiha qedand: "Kûrê min nînin, çend çêbûn lê di heman rojê de mirin. Jiyana min pir biêş e, hem li ber zarokên xwe dimînim, hem karê derve dikim. Astengdariya zarokên min ne bes bû bi ser de koçberî jî hat."

Tirkiye careke din daişê bi kar tîne...lê bi awayekî din !!!

Farûk SAKIK

Hilbijartinên Amerîka bi dawî bûn û Biden bu serok. Daxwaza Erdogan a serdana Amerîka bi tu awayî nayê qebûl kirin. Erdogan ji bo randevûyek bigire çi ji destê tê dike. Lê dîsa jî bersivek nagire.
Di demek waha de tiştên pirr ecêb li Tirkiyê qewimîn. Di van rojên dawî de, li Turkiyê gelek nûçeyên girtina endamên DAÎŞ'ê di medya AKP'ê de hatin parvekirin.
Ev nûçe di dawiya mehên sala 2020'an de, zêdetir bûn. Ev jî teqabûlî pêvajoya hilbijartinên Amerîka dike.
Bangî rojnamevanan kirin ku bibin şahidê binçavkirina wan kesên hatine girtin. Piştî şahidiya rojnamevanan ev kes di deriyê paş de jî serbestî hatin berdan.
Me, ev nêzikatiya AKP'ê di doza Hîzbûllahan de jî dît. Ji bo serbestberdana van kujer û qatilên Kurdên welatparêz, di qanûnê xwe de guhertinek çêkirin û di şevekê de hemû endamê Hîzbûllahê serbest berdan. Piştî ku ditin van kesan ji sînoran derbas bûne, gotin; şaşîtiyek bûye. Gelek ji van qatilên endamê Hizbîkontra çûn tevlî nav DAÎŞ'ê û El-Kaîde bûn. Ji Erdogan re deyindarbûn. Erdogan bi rêya van kesan bi DAÎŞ'ê re têkilî danî.
Yek daxwazek Erdogan ji DAÎŞ hebû; dixwest piştî Mûsil û Şengalê berê xwe bide Rojava; Ü DAÎŞ wisa kir... Êrişên li dijî rojava destpê kirin. Lê encam û aqûbeta wan jî li Kobanê tê zanîn.
AKP û Erdogan bi vê rêxistina dijminê mirovahiyê re, çiqas dost bûn û ev çete çiqas bikaranîn, bi belgeyan hemû cîhan dizane.
Danûstandinên wan di dagirkirina DAÎŞ a Musûlê de jî me dît. 49 xebatkarên Balyozxaneya Mûsûlê wek rehîne ketibûn destê DAÎŞe. Piştre hat îspatkirin ku di encama lihevkirinek de ew 49 kes hatine girtin. Lê piştî demekê, çi hikmet bû serbestî hatin berdan. Bi tenê rehîneyên Tirk serbestî hatibûn berdan. Lê li aliyê din DAÎŞ, rehîneyan di destê xwe de bi awayek hovane qetil dikirin. Dema ku li Kobanê şervanên Kurdan ev DAÎŞ'a hov ji Kobanê heta Dêrazorê paqij kirin, di serî de Amerîka hemû cîhan bi kurdan bawerî anî. Ji wê demê ve bi Kurdan re li dijî DAÎŞê têdikoşin.
Lê Erdogan ev yek nedixwest. Dema ku hilbijartinên Amerîka destpêkirin, Erdogan jî li rêyek din geriya. Hikumet û serokê nû yê Amerîka çawa dikaribû îkna bike ku Kurdên Rojava ji holê rake. Difikirî, Amerîka ji ber têkoşîna Kurdan a li dijî DAÎŞê, bi Kurdan re tevdigere. Wî jî xwest ji wêderê destpê bike.
Bi girtin û 'serbestberdana' çeteyên DAÎŞ'ê re, peyam dida Amerîka.
Tirkiye dixwaze, bi navê têkoşîna li dijî DAÎŞ'ê balê bikişîne ser xwe. Amerîka îkna bike. Di dewsa QSD'ê de Artêşa Tirk û çeteyan bicîh bike. Heger ev yek bikeve meriyetê wê derbasî plana duyem bibe û êrişî Kurdan bike. Bi kurtasî ji Amerîka re dibije; dewsa Kurdan de, min tercîh bike.
Ji bo reşkirina Kurdan ji destê çi hat pêkanî. Nebû, di derewên xwe de zîrve kir û got; 'kesên li Amerîka êrişî avahiya Kongrê kirin, endamê PYD'ê ne.'
Dema herkesî kenê xwe bi wan kir, vegerîyan careke din, manşetên "endamê DAÎŞ'ê hatin girtin" avêtin. Di nûçeyeke xwe de digotin "endamekî DAÎŞ'ê ku jineke Êzidî revand û li bazaran firot hat girtin. Ev nûçe jî ji bo Şengalê, ji bo xapandina hin eşîrên herêmê hatibû amadekirin.
Ka, emê binihêrin, di rojên pêş de ji bo xapandina Amerîka wê kîjan manşetê biavêjin.

Jibîrkirin xîyanet e

Jiyan BOZO/Qamişlo

Dibêjin eşq pir zor e û ti hest û helwest nikarin bînin ziman. Li bakur û rojhilatê Sûrî ji 9ê Cotmeha 2019an ve piştî dagîrkirina Serê Kaniyê gelek ciwan bi agirê eşqa welatê xwe dişewitîn û ti tiştî nikarî kela volkana dilê wan vemrîne.

"ÇI DIBE BILA BIBE EMÊ LI SERÊ KANIYÊ VEGERIN"

Têkîldarî mijarê rojnemevan Lêzan Evdikê wiha axivî: "Ez ji bajarê Serê Kaniyê me. Ez 19 salî me, fakûlteya endeziyariyê dixwînim û li rojnameya Ronahî dixebitim. Serê Kaniyê ji min re can, candek, zarokatî û hebûna min e. Ev salek e ji warê xwe dûr ketime. Lê rojekê jî ji xeyalên min qut nebûye û nabe jî. Dema ew koçberiya bi sedhezaran tê ber çavê min, dilê min diêşe. Min qet bawer nedikir ku emê jî rojekê ji xaka xwe ya pîroz derkevin. Pir li zora min diçe dema hin kes li ser navê Serê Kaniyê parsê dikin. Ji dema em derketîn heta niha ez qet li malê rûneniştime. Çimkî dem ne dema rûniştinê ye. Min di her qadê de kar kir. Min bi dayîka xwe re û hin saziyên mafê mirovan re alîkarî li koçberên kampan belav kir. Çimkî welatê me dagîrkirî ye û bi sedhezaran koçber bûne."
Lêzan Evdikê axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Niha bi pênûsa xwe têkoşîna xwe didomînim. Bi vî temenê xwe yê piçûk dikarim ji dagîrkeran re bibim bersiv û dengê gelê xwe. Girî ne çareserî ye, divê her kes li hemberî vê rewşê bihêrs be û têkoşîna xwe xurt bike. Ji bo rizgarkirina Serê Kaniyê, Efrîn û Kurdistanê bi giştî divê em yakîtiya xwe ava bikin. Çi dibe bila bibe emê li Serê Kaniyê vegerin."

"EZ WÊ ROJA REŞ JI BÎR NAKIM"

Mamoste Bêrîvan Temûş jî wiha got: "Ez ji warê berxwedanê Serê Kaniyê me. Mamosteya zimanê Kurdî me. Ez çi bêjim têrê nake. Çawa ku mirov bê dayîka xwe sêwî û tenê ye, dûrbûna ji Serê Kaniyê jî heman tişt e. Ma zarok bê dayîk dibin, can bê dil dibe? Emê çawa bê wê xaka pîroz bijîn?

Ez nikarim bi çend peyvan wê hesretê binirxînim. Nêzî sakê û 5 mehan e ji warê xwe dûr ketime. Min ti carî xeyal nedikir ku ji Serê Kaniyê dûr bikevim. Min ji xwe re digot, du roj in û emê dîsa vegerin. Lê mixabin bû salek ku em jê dûr in. Mozaîka gelan îro reş girê daye. Jiyan lê kirin dojeh. Bi çi mafî welatê me dagîr kirin. Bi sedhezaran koçber kirin. Bajar bi giştî talan kirin. Ez wê roja reş ji bîr nakim. Dema dûmana reş bi ser bajêr ket, êdî jiyan lê bi dawî bû. Xwestin me tine bikin. Lê em zarokên agir û rojê ne, ti carî serî

ji wan re danaynin. Bi salan e vê hovîtiyê dikin, lê nikarin me tine bikin. Çimkî em naviyên Kawayê Hesinkar in."
Bêrîvan Temûş bi van gotinan bi dawî kir: "Ji bo em dewleta tirkî ya dagîrker têk bibin û kesên xwefiroş ceza bikin, divê em yekîtiya xwe ava bikin. Me li Serê Kaniyê bi sedan şehîd dan. Ji bo wê divê em li wê berxwedenê xwedî derkevin. Çimkî jibîrkirin xiyanet e. Em jî xiyanetê li wê xakê û xwînê nakin. Ez ti carî hêviyên xwe qut nakim. Emê vegerin ser wê xaka pîroz. Emê vegerin bihişta xwe."

Zubeyde ji nebatan rûn û merhemê çêdike

Sema Çaglak

Zubeyde Şeker a ku li gundê Zêruga Pasûrê dijî bi nebatên ku berhev dike rûn û merheman çêdike. Zubeydeya ku di zarokatiya xwe de berhemên xwezayê kifş kiriye wiha dibêje: "Çawa ku xweza hilberîner e jin jî hildiberînin. Bi vî awayî ji gelek aliyên jin û xwezayê dişibin hevdû."

Jin, parastina xweza û çand û mîrateya xwe ji serencama dîrokê de heya roja îro didomîne. Bi vî awayî vehûnandina jiyana xwe re şikl dide û bi xwezayê re hevdu temam dikin. Bi zivistanê re pêdiviya mirovan zêdetir bi nebat û çayên giyayê çêdibe. Jinên ku bi salan in kevneşopiya xwe didomînin, li her deverên herêmê sûdê ji nebatan digirin.

Wê demê em ê berê xwe bidin gundê Zêrug ya girêdayî navçeya Pasûr a Amedê. Zêrug bi dewlemendiya xwezayê xwe ve tê nasîn, bi dîmenên zivistanê ya xweşik mirovê di bin bandora xwe de dihêle. Her wiha bi nebatên curbicûr jî xwedî axekê dewlemend e. Zubeyde Şeker 39 salî ye û li gundê Zêrugê dijî. Bi hewldana xwe mîrate û çanda jinan a nebatê aniye heta îro.

'Ji zarokatiyê de bala min li ser nebatan hebû'

Eleqeya Zubeyde ya nebatan hêj di zarokatiyê de dest pê kiriye û wiha behsa xwe ya têkiliya nebatan dike: "Li derdora mala me gelek cûreyên nebatan hene lê min nedizanî ku sûda wan nebatan çi ye. Min ji mezinên xwe pirs kir û bi vî awayî min cûreyên nebatan nas kir. Çiqas ez li ser wan nebatan hûr bûm, min dît ku jixwe ew zanîst di çand û jiyana jinan de hebûye. Wek kevneşopiyek hatiye heta îro. Berê de dayik û pîrên me bi nebatan dermanan çêdikirin. Bal û meraqa min li ser wan mijaran hebû."

'Ez xwe di nav xwezayê de dibînim'

Zubeyde anî ziman ku nêzîkatiya jinê ya li ser xwezayê ne tesadûf e û axaftina xwe re wiha berdewam dike: "Çawa ku xweza hilberîner e jin jî, dihilbirîne. Bi

vî awayî ji gelek aliyên ve dişibin hevdû. Ez xwe di nav xwezayê de dibînim. Gava xwe temasê xakê dikim, enerjiyek pir baş li ser min çêdibe. Mirov vê hîsê nikare pênase bike. Dewlemendiya axa me gelek zêde ye. Bi saya wê min ewqas berhevkirina nebatan kir û xwest ew tiştê binirxînim. Ji bo ku sûda wê bigihînim civakê. Lê belê dema ku ez nebatan berhev dikim zirarê nadim xwezayê. Divê mirov dema ku nebatê jê dike koka wê bihêle. Ji bo ku jinûve şîn bibe."

'Ji nebatan rûn û merhem çêdikim'

Zubeyde berdewamiya axaftina xwe de bal kişand li ser çêkirina rûnê ku ji nebatan çêdike û wiha axivî: "Di destpêkê nebatên ku kom dikim ji kulîlkên wan cuda dixim û wan bi avê dişom. Piştre wan li ber tavê ziwa dikim. Dûvre wan nebatan dixim qevanozekê û rûna zeytûn a pak li ser zêde dikim. Herî dawî jî ew qevanozê datînim ber tavê û 40 roj wisa dimînе. Ji wê pêvajoya çêkirina rûnê re jî meserasyon tê binavkirin. Çêkirina rûnê havîn û biharê dikarim çêkim. Niha jî ji ber sarbûna hewayê min dest bi çêkirina merheman kir. Merheman jî dîsa ji rûnê çêdikim. Rûnên ku di hewayê germ de çêkiribû dixim nav şûşeyekê û ava kelandî dixim ser. Maddeyên ku jê re pêwîst e li ser zêde dikim û datînim cihekî ku xwe bigire."

'Berhemên ku çêdikim gelek bal dikişîne'

Zubeyde bilêv kir ku sûd û zanînên xwe yên li ser giyayê jî parve dike û wiha got: "Dixwazim xwe bigihîne her deveran. Dema ku jin karê min a wisa dibînin gelek kêfa wan tê û piştgiriyê didin. Min çawa kifş kir, dixwazim jinên din jî kifş bikin û li ser xweza û giyayan hûr bibin. Li cihê ku em dijîn, hewayek sar e. Loma li gorî hewayê jî em dermanan çêdikin. Ji bo derman û giyayan xwesteka welatiyên gund jî hene. Di aliyê nexweşînên zivistanê û bihêzbûna xweparastina laşe nebat gelek baş tên. Ango wek şîfayê ye. Dermanên ku bi piranî ji nebatan tê çêkirin ji bo nexweşîna jinan e. Jin jî li gorî derfetên xwe wan dermanan pêş xistine."

Dermana ji bo gurçikan: dirîreş

Zubeyde, derbarê çend nebatan de wan agahiyan da: "Dirîreş, nebatek û mêweyek reş û şîrin ku dara wê bi dirî ye. Li her deverên Kurdistanê bi navekê cuda tê pênasekirin. Lewra gelek cûreyên wê hene. Sûda dirîreşê herî zêde ji bo gurçikan baş ê. Her wiha ji bo îltihaba çavan jî baş e û ji bo dermana çav jî divê bê kutan. Yek ji feydeyek wê jî ew e ku ji bo diranan jî baş e. Ji bo ku êşa diranan biçe wê dihelînin û dixin nav pineyek paqij û datînin li ser diranan. Çaya wê nebatê jî ji bo gurçikê wek derman e."

Depoya vîtamîna C: Şîlan

Zubeyde piştî ku danasîna dirîreşê kir, dara şîlanê nîşanê me da û destnîşan kir ku nebata şîlanê, di bijîşknasî û dermannasî de ji hêla hewandina vîtamîna C yê di dinyayê de riweka herî dewlemend e. Zubeyde berdewamiya axaftina xwe de wiha pêdê çû: "Şîlan payîzê digihêje. Kulîlkên şîlanê jî di dermanên tibî, parfum, ava gulan de tê bikaranîn. Bi taybet jî ji bo xurkitina pergala xweparastinê wek çay û rîçal tê bikaranîn. Şîlan, 60 car ji vîmonê baştir e. Zêde di hewaya sermaye de dikare îdare bike. Niha ji ber hewaya sar bandora wê êdî zêde dibe. Ji bona xwînê gelek baş e. Enfeksîyon û danûstandina bêhnê vedike. Vîtamîna wê ya C zêde ye. Heben wê ez kom dikim bi mehan di bin roj de dimîne. Bi vî awayî bandora wê zêde dibe. Di rojekê de fîncanek çaya wê têrî dike."

Şifaya ji bo bêhnefişkî û bronşit: Hacacû

Zubeyde herî dawî nebata bi navê hacacû nîşan da û wiha got: "Rengên dermanên xwe ji wê derdixim. Rûnê xwe têdê germ dikim û rengê xwe dide. Ew renga sor çêdike. Kulîlka wê jî ji bo bêhnefişkî û bronşîtê baş tê. Kesên ku kuxika wan zêde hebe ji bo wan kulîlkên wê nebatê dikelînin weke dermane. Di nav kulîlkên wan de avek wek şîrê derdikeve û ew jî tê bikaranîn."

'Jin tu carî ji xwezayê qût nebûye'

Zubeyde da zanîn ku sûda nebatan ji aliyê gelek kesan tê zanîn lê belê nikarin vê yekê kifş bikin û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Ji bo ku hem çand û zanîna jinan winda nebe hem jî ji bo ku şifaya nebatan xwe bigihîne hemû kesan, dixwazim karê xwe berfireht bikim. Gava em dinêhêrin jinan, bi havînê bi karên baxçe û ajalan ve mijûl in."

JINNEWS

Divê em şoreşa jinan berfireh bikin

Rêber Abdullah Ocalan di 8'ê Adarê Roja Jinan a Cîhanê ya sala 1998 'an de ji MED TV re ev nirxandin kiriye.

ABDULLAH OCALAN

Rêber Abdullah Ocalan di 8'ê Adarê Roja Jinan a Cîhanê ya sala 1998 'an de ji MED TV re ev nirxandin kiriye.
'Divê em şoreşa jinan berfireh bikin da ku şoreşên serdema li pêş me, heta şoreşên sedsala 21'an û pêvajoyên aştiyê yên piştî wan, rast û durist bibin.'
Beriya her tiştî ez ne qayîl im ku tenê 8'ê Adarê bibe Roja Jinan a Cîhanê. Şertekî teqes yê jiyanê ye ku hemû roj bi jinan û bi jinên azad re bin. Lê rastiya 8'ê Adarê jî pir zelal nîşan dide ku di jiyanê de jin tune ne. Ev yek asta koletiyê nîşan dide ku bi tenê di rojeke wiha de hêjayî bîranînê bin. Ev ji bo min qadeke xebatê ye ku her ku diçe lê hûr dibim. Ez li derveyî şer nabînim. Heta wekî hemû şoreşan divê pirsgirêka herî bingehîn a ku şoreşên îro û bi taybet şoreşa Kurdistanê çareser bike; dahûrandina jiyanê li dora jinan e. Ji pirsgirêkên şer ên herî pêşketî heta aştiyê û pêşketina wê ya li ser bingeheke azad, li navenda van karan e.
Heta ku jin li gel rastiya zîhniyet, îdeolojî, rêxistin, zext û mêtingeriya li dora wan hatiya pêçandin, neyên nirxandin û çareserî li ser vê bingehê neyê pêşvebirin; heta ku şoreş –pê re jî şer- li derveyî jinan bê dîtin, ne mimkun e ku şer bibe şerê azadiyê û ne jî aştiya piştî wê bibe aştiyeke rasteqîn. Şertê pêşîn û sereke yê vê yekê, jihevkirina tora têkiliyan a li dora jinan e. Ji malbatê bigire heta exlaq û heta felsefe û jiyana olî, ev tev di vî warî de çi dibêjin? Ji wê jî zêdetir, çi kirine û difikirin çi bikin? Bi xwe pergaleke çawa hatiye avakirin? Çareserkirina wan tevan, meseleyeke jiyanî ye. Her ku ez li Şoreşa Kurdistanê hûr bûm, baldariya min a li ser pirsgirêkê zêdetir bû û li çareseriyekê geriyam. Divê ez bibêjim ku ev yek ji şer dûr nîn e. Hem ji bo pêşvebirina şer, hem jî li ser fêmkirina wateya wî ya rast, ez hewcedariyê pê dibînim ku vê pirsgirêkê bi awawyekî cidî binirxînim. Jixwe tê gotin ku 'bê jin şoreş nabe, jiyan nabe' û ev rast e. Lê belê di roja îroyîn de hema hema e awayê jiyana bi jinan re, bi ser de jî jiyana bi mêran re ya di bin statukoya heyî de, awayekî jiyanê ye ku ez hê jî ji bo qebûlkirina wê zehmetiyê dikêşim. Heta, heke ez bêjim min şoreşa xwe ji bo guherandina vî awayê jiyanê bi pêş xistiye, belkî jî ez ê rastiyekê bi aşkerayî bînim ser ziman.

'DIVÊ HEMÛ ROJ WEK '8 ADARAN' BÊN DÎTIN'

Her wekî adet e, heke pirsa '8'ê Adarê ji bo jinên cîhanî wateya xwe çi ye?' bê kirin, bersiva wê dê wiha be; bibîrketin û bibîranîna koletiyeke kûrbûyî, pir sembolîk û heta li gorî min hinekî jî girîngiyeke têra xwe cidî pê nedayîn e. Çima rojek dibe roja jinan? Hêmana bingehîn a jiyanê çima tenê hêjayî bibîranîna di rojekê de tê dîtin? Û rojeke wekî roja dayikan jî diyarî vê rojê dikin. Li gorî min ev nîşaneya bêsamîmiyetê ne, divê ev yek bê derbaskirin. Divê roj hemû wek '8 Adaran' bên dîtin û pêşxistin.



'EZ PIRSGIRÊKÊ GELEKÎ BERFIREHTIR Û GIŞTÎTIR DINIRXÎNIM'

Ez difikirim ku eleqeya jinê dê gav bi gav bi pêş bikeve. Sedema bingehîn a vê yekê jî israra parastina hebûna cîhaneke serdestiya mêran e ku dê xweziyê bi ya kevn bîne. Di rastiyê de îdeolojiya serdest a mêran, lêanîna wê ya li jiyanê, pirsgirêka jinê girantir kiriye. Bi taybetî di şoreşên dawîn ên sedsala 20'an de ji bo jinan hin pêşketin hebûn, lê belê çareseriyeke tam nehate dîtin. Di rastiyê de li welatên ku reel sosyalîzm lê pêk hat û fermî bû jî, diyar e ku ev yek bi şoreşa jinan re nayê kirin û di kesayetên rêbertiya sosyalîst ên dibêjin ku herî baş ez pîvana jiyanê me jî, rêgezên jiyana klasîk parastin. Rast e ku min ew hinekî cuda dît û pirsgirêk pir berfireh û pir gelemperî (gerdûnî) nirxand.

'WEK KESAYETEKE MÊR, EZ HÎNA JÎ LÊGERÎNA JIYANÊ DIDOMÎNIM'

Ez li vir tenê bi berçavkirina pêdiviyên şoreşeke rizgariya neteweyî re analîza jinê nakim. A rast ferasteke min a teng a wekî 'nîvê gel in, bêyî wan şoreş nabe' ji bo paşvedana rewşa heyî nîn e. Ez hîn berfirehtir pê re mijûl dibim. Ji bo min xebateke felsefe û moralê ye. Ji bo ku ez têgihîştina xwe ya sosyalîst derxim holê, divê ez vê yekê çareser bikim. Wek kesayeteke mêr, ez hîna lêgerîna jiyanê didomînim. Dema pirsa 'Divê jiyan bi jinê re çawa be, divê jiyan bi gîştî çawa be' tê pirsîn, pirsa 'divê jiyan bi jinê re çawa be' pirsek e ku divê ez hîna lê hûr bibim.
Divê ez destnîşan bikim ku ji bo vê yekê pişta xwe nadim tu pêşdarazeke kevnepoşî û nirxekî exlaqî ku ji nêzîkatiyên cinsî bigire heta ji jinê re di hemû qadan de parvekirina jiyanê, di polîtîka û heta xebatên artêşbûnê de parvekirinê, ez dibînim ku pirsgirêk hene. Bi min girîng e ku ev bi aşkerayî bên nîqaşkirin. Ev yek zêdetir min eleqedar dike ku bi tenê di nava sînorên nîqaşê de nemîne û ev yek ber bi çarseriyên şoreşgerî yên balkêştir an jî bibandortir ve were birin. Û vê yekê wek karekî herî sereke dibînim ku divê sosyalîzma serdemê pê rabe. Têkoşîna çînî bi tena serê xwe têrê nake –jixwe di sosyalîzma reel de ev yek gelekî hatiye piştrastkirin- di roja îroyîn de pirsgirêkên qerase yên hawîrdorê, kapîtalîzmemperyalîzmê çawa xweza bi yekcarî texrîb kiriye û wisa lê kiriye ku jiyan lê nabe. Ji bo vê yekê divê çareseriyek bi şoreşeke sosyalîst çawa bê dîtin, her wisa ji bo meseleya jinan jî têra xwe derbasdar e.

'ŞER Û AŞTÎ DI ESLÊ XWE DE PIRSGIRÊKEKE JINAN E'

Baweriya min ew e ku ev pirsgirêka têkiliya xwe bi tevahiya qadên jiyanê re heye, li derveyî nêzîkatiyên pergala heyî, ji yên îdeolojîk bigire heta bihevrebûnên pratîk, heta zewac jî divê ji nû ve werin dahûrandin û her wiha di her warî de pêdivî bi nêzîkatiyên nû heye. Heke mirov bala xwe bidê, ev nêzîkatiyên min, nêzîkatiyeke gelekî gerdûnî ye. Bi tenê girêdayî girseya jinan a neteweyî nîn e. Di vî warî de di qada navneteweyî de jî eleqedarî jê re zêde dibe. Feraseteke wiha ya sosyalîzmê, bê guman dê jinan zêdetir bîne rojevê. Pirsgirêka jinan bi tenê di çarçoveya zayendê de –di çarçoveya rêxistinê de na- di hemû qadên civakê de wek 'divê çawa be' bê nirxandin. Û her ku bersiv bên jî, dê were dîtin ku şer û aştî di eslê xwe de pirsgirêkeke jinan e. Dê bê dîtin ku heta ku vîna jinan, kesayeta jinan nekeve rojevê, çareseriyên girêdayî ferasetên serdestiyamêran ne şer, ne jî aştiyê bi tena serê xwe hel nakin.
Lewma jî divê em şoreşa jinan berfireh bikin da ku şoreşên serdema li pêş me, heta şoreşên sedsala 21'an û pêvajoyên aştiyê yên piştî wan, rast û durist bibin.

'MIFTEYA JIYANÊ JÎ, MIFTEYA ŞER JÎ DI DESTÊ ME DE YE'

Mifteya jiyanê jî û ya şer jî di destê me de ye. Ez çi bixwazim, ez ê pê vekim. Ev yek vedîtineke herî bedew an jî qonaxa herî bedew a hatinê ye. Ev ji bo we ye, ji bo mirovên me yên ku tune dikin. Ev ji bo kesên bi gotina 'tu ne tu tiştî' xwe kêm û bê wate dibînin, pêşketineke pir mezin e. Ev dahênake herî mezin e. Ez vê didime we. Ez dîsa vê yekê dupat dikim û ne ku ji bo ku ez bibêjim heqê min li ser we heye. Tişta ku we di sed salan de bi tena serê xwe nekaribûya bikira, me ji bo we pêk anî, teqdîr bikin.

'EZ VÊ WÊREKIYÊ LI SER NAVÊ MALBATA XWE NAKIM'

Yên leheng, mezin diafirînin û pêşkêşî gelê xwe, hevrêyên xwe dikin. Dîrok bi wêrekiyên wiha tijî ye. Bêaqil nikarin teqdîr bikin û nikarin hurmetê bidinê, ew xweperest in. Û mîna ku min got, ez vê wêrekiyê li ser navê malbata xwe nakim. Di serî de li ser esasê dilsoziya bi bîranîna şehîdên me yên mezin re ez vê yekê bi saya pabendiya bilind a gelê me dikim û dîsa bi saya pabendiyên we, her çendî pir lewaz bin jî. Ev encama dilsoziyê ye ku em nîşanî nirxên pîroz didin.

28'ê Sibatê

Ahmet Aktaş

Berî 6 salan 28 Sibat 2015', li Dolmabahçeya Stenbolê, lihevhatinek dîrokî pêkhat. Ev rêkeftin, di navbêna şandeya bi hemû pêkhateyên xwe ya Tevgêra Kurd a ku bi kesayetî û pêşengtiya Rêbar APO ve û şandeya dewleta tirk de pêkhat. Di dîrokê de ev cara yekemîn e bûyerek wisa rûdide.
Bê gûman ev pêvajo, di encama gotûbêjên navbêna Rêber APO û nûnerên dewletê de yên bi salan ve bû ku gihişt vê aşta peymanek ji 10 xalan pêkhatî.
Li goreyî şandeyên diçûn li gel Rêber APO guftûgo dikirin, rakêşa nîqaşên navbêna Wî û nonerên dewletê gelek dijwar bûn e. Heta xwe gihandiye qonaxa rêkeftina Dolmabahçeyê, gelek wext ştandiye, gelek kes hatiye dayin û gelek mejî hatiye xebitandin.
Ji wan gotûbejên navbêna wan, du mijarên balkêş wisa diyar dikin. Yek jê mijara maf û rola jinê bû ye. Nûnerên dewletê bi rijd xweştine vê mijarê ji peymanê derxin. Lê Rêber APO jî, bi rijd têkoşiyaye ku vê mijarê dernexe, di nava peymanê de bihêle û wisa jî kir.
Weke tê zanîn, mijara rola jinê di civakê û şoreşê de mijarek bingehîn yek ji felsefeya Wî bû, êdî rojane ji gotinê derbasî jiyanê dibû. Bi taybetî jî li Rojava rola jînê ya pêşeng di cevakê û şoreşê de, zelaltir derdiket ber çavê raya gîştî. Nuha hîn pirtir tê zanîn ku ne bi tenê R.Erdogan, belê hevalbendên wî yên hegemonên cîhanê jî ev rastî didîtin û jê tirsiyan, lewma bi rijd xweştin jî vê rêkeftinê/peymanê were derxistin.
Mînaka duduyan a belkêş jî, şande dibêje "wexta em li Imralî di gotûbêjen de bûn, hevalekî me ji Rêber APO re got 'min agahiyên piştrastkirî ştandine ku AKP'yî, hewldidin bi Ergenekoniyan û MHP'yiyan re, lihevbikin'! Li ser vêna gelek kûr fikirî û ji nûnerê dewletê jî, rastiya vê gotinê pirs kir, noner got 'min agahî jê nîne, eger fêr bibim ez ê we agahdar bikim' û hwd".
Ji xwe piştî wê gotinê Rêber APO dibêje, "eger ev pêvajo were xerakirin, faşîzm bi tevayî dibe destîhilat"!
Nuha diyar dibe ku ew agahî rast bû, lewma R.Erdogan, piştî du mehan di 29'ê Nîsanê de, ragihand ku maseya Dolmabahçeyê diqelibîne û wê rêkeftinê nasnake! Hema li pey vê daxwiyaniyê AKP'ê, 2 rojan berî hilbijartina 7'ê Hezîranê destê bi provakasyon û kiryarên qirkirinê kirin. Gava yekê provakasyona mitînga AMED'ê bû.
Lê ji ber ku di hilbijartina 7'ê Hezîranê de bi ser neketin û rêveberiya wan hilweşiya, gelek tirsiyan, dît in ku destîhilatiya wan bi temamî ji destê diçe, ev hilbijartin nasnekirin û bi lezgînî, ji bo di hilbijartina 1 ê Mijdarê de bi serkevin êdî destê bi qirkirinên hîn mezintir kirin: Komkujiya Pirsûsê û Gar a Ankarayê û hwd.
Bi wê zîhniyeta malxerab a R.Erdogan, ew xebat û keda bi pêşangiya Rêbar APO ve hatibû meşandin û ştewandin, hemû avêtin erdê û gel xistin nava şeş salên tije xwîn û xem û êşkencê!
Bê gûman bi ser neketin. Berovajî, rûyê destîhilatiya wan li mirinê ye. Erê gel pir zulum û êş kişand, lê serî ne tewand û rûyê gel li serkeftinê ye. Peymanên hîn tijetir û berfirehtir ji 28'ê Sibatê, li ber gel e, ne dûr nêz in! Nîşana herî hêja û nûjen a li ber çavan, ruhê SERKEFTÎNA GARÊ ye!
TÊBÎNÎ: 28'ê Sibata 1997'an, a post-modern a li dijî rêvebriya N.Erbakan çêbû jî heye û têkiliyê wê bi vê 28'ê Sibata 2015'an ra jî heye, lê bila ew bimîne ji gotarek din re.

Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî bang li PDK`ê kir ku rojnamevanên Behdîna berde

Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî (Amnesty İnternational) derbarê girtiyên Behdîna yên di girtîgeha Hewlêrê de nameyek ji hikumeta aşûrê Kurdistanê re şand û bang kir ku rojnamevanên hatine girtin, berdin.

16'ê Sibatê Dadgeha Ceza ya Hewlêrê 6 sal ceza li Şêrwan Şêrwanî, Şivan Seîd, Guhdar Zêbarî, Eyaz Kerem û Harîwan Îsa birîn. Ev biryar li başûrê Kurdistanê û derveyî welat bû sedema bertekan. Herwiha hê nêzî 50 kesên din yên ji aliyê PDK'ê ve hatîn destgîrkirin, di girtîgehê de ne. Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî (Amnesty İnternational) li ser girtina rojnamevanên Behdîna, ji nûnerê Ofîsa Bersivdayîna Raporên Navneteweyî yên hikûmeta Herêma Kurdistanê Dîndar Zêbarî re nameyek şand.
Rêxistinê di nameya xwe de darizandina rojnamevanan bi darizandineke ne adil bi nav kir û got, niha 5 rojnamevan ketine greva birçîbûnê û tê payîn ku heta 16'ê Adarê çalakiya xwe bidomînin. Divê kesên hatîn girtin bê şert werin azadkirin.

Destdirêjî şerê li hemberî mirovayiyê ye

Leylan RESO/Qamişlo

Hişmendîya zilamê desthilatdar eve 5 hezarsale li hemberê jinê serdestîya xwe bi zilimekê bêhempa dimeşîne. Evê bi şêwazên her cûre şidet dike. Li beramberî vê yekê jî çiqas tekoşîna jina azad hebe jî êrîşên li ser jin û zarokan hê xilas nebû ye.
27'ê Sibatê li Tirbêspiyê kesê bi navê Ebdilehed Goriyê (47) destdirêjî li zarokek çar salî kir. Li hemberê vê kiryara hovane gel diyar kir ku ev kiryare êrişekê li hemberê mirovahîyê ye.

"DIVÊ RADESESTÎ DADGEHA RÊVEBERIYA XWESER BIBE"

Derbarê mijarê de welatiyê bi navê Ridwan Oncû dîyar kir ku tecawizkar bi kiryara xwe li dijî mirovahîyê derketîye û divê bi şêvazekî ku bibe îbret bê cezakirin û gotinên xwe wiha bilêv kir; "Ev yek li dijmirovahiyê ye û tê wateya ku hişmendiya zilamê serdest yê bi hezarê salan hê dewam dike. Ku ev kesê hov di nava destê min bikeve ezê wî parçe bikim. Ku birayê min ba jî wê helwesta min heman tişba ye. Divê ev zilam radesestî dadgeha Rêveberiya Xweser bibe û were darvekirin ji bo bibe mînak ji hemû kesên weke wî re."

"11 SALIN EM TÊKOŞÎNÊ LI HEMBERÎ HIŞMENDIYA ZILAMÊ SERDEST DIKIN"

Jina bi navê Xalîsa Umer jî li ser mijarê wiha axivî: " 11 salin em têkoşînê li hemberî hişmendiya zilamê serdest dikin. Ji ber wê jî divê asta têkoşîna me ya zayendî li hemberî zilam xurt bibe û tevayiya jin rabin li ser piyan û bêjin emê bi xwe ji vî zilamî hesab bixwazin. Em qebûl nakin tiştekî wisa li zarokên me bên kirin. Tecawizkirin ne tenê li hemberî jinê, di dema dawî de hem jin hem jî zarokên piçûk weke keç û law tên kirin. Hêvî dikim ku her kes rabe û bêjin em vê kiryarê qet qebûl nakin."

"TECAWIZKIRINA SER VÊ ZAROKÊ, SER TEVYIYA JINAN E"

Rojnemevana bi navê Jiyan Bozo jî ev nirxandin kir: "Dewamkirina hişmendiyê zilam ya serdest tê wateya tunekirina jinê. Ji ber wê jî tecawizkirina ser vê zarokê, Ser tevayiya jinan e, ji ber ku zarokeke nikare xwe biparêze tecawizkirina wê binpêkirina mafê mirovan e. Darvekirin di sîstema me de nîne, lê tişta ku heyî divê radestî dadgeha Rêveberiya Xweser bibe. Yan jî radestî gelê herêmê bikin û li ser esasê wê cezayê herî giran were xwestin. Ji ber ku ev zilam hesab jê neyê xwestin û bi rehetî bê berdan ewê bi hezaran kes wisa bikin û destdirêjî wê dewam bike."
Jiyan Bozo axaftina xwe bi van gotinan bi dawî kir: "Keça ku li Terbespiyê hat tecawizkirin, heman hişmendî li Efrîn, Girê sipî, Serê Kaniyê û li tevayîya cîhanê tê meşandin. Ji bo wê jî ev hişmendî dixweze ku ev sîstemên kapîtalîzim û dewletên dagîrker civakeke bê exlaq û ji çanda xwe dûr pêş bixin. Ji bo wê jî tecawiz li hemberî civak û têkoşna me ya jinê em jî vê yekê bi tundî şemzar dikin. Ew zilam jî divê radestî dadgeha jinê bibe Ji bo ku her kes li gorî pîvanên jinê tev bigerin da ku zîhnîyeta tecawizê ji nava civaka me derkeve."

Ji bo azadîya rojnamevanên PDK`ê girtîn kampanye hat destpêkirin

Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî (Amnesty İnternational) ji bo azadiya 5 rojnamevan û çalakvanên di girtîgeha PDK`ê de dest bi kampanyaya komkirina imzeyan kir.
16'ê Sibatê Dadgeha Hewlêrê bi îdiaya "sîxûrî û têkbirina aramiya başûrê Kurdistanê" ji bo Şêrwan Şêrwanî, Şivan Seîd, Guhdar Zêbarî, Eyaz Kerem û Harîwan Îsa 6 sal cezaya girtîgehê birî. Ev biryar li başûrê Kurdistanê û derveyî welat bû sedema bertekan. Di vê çarçoveyê de Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî (Amnesty İnternational) ji bo piştgirî û azadiya 5 rojnamevan û çalakvanên Behdîna yên girtî bi riya înternetê dest bi kampanya komkirina imzeyan kir.
Amnesty İnternationalê ragihand ku ev her 5 kes bi neheqî û neqanûnî hatine girtin. Herwiha daxwazî ji Dîndar Zêbarî dike ku ji bo berdana wan kar bike.
Hûn dikarin li ser vê linka li jêrê imzeya wxe bidin.
https://www.amnesty.org.uk/urgent-actions/iraqkrg-journalists-must-be-released-immediately

Erdogan dixwaze bibe qehremanê Kurd tine kirîn

Zekî BEDRAN

Hîtler piştî ku rêveberî tev xist destê xwe hêza dewletê tev ji bo şer û qirkirinê bi kar anî. Ji bo Hîtler ti nirxên mirovî û exlaqî ne girîng bûn. Rexne û şiyarîyan ti bandor lê nekirin. Bi hêzê bawer dikir û her tim hêz bi kar anî. Gotin, qanûn tev kirin parçeyên hêzê û xizmeta şer. Di dawiyê de bû sedema hilweşîna dîrokî ya herî mezin ya dinyayê. Enceq bi şkandina hêzê hat sekinandin. Niha rêveberiya Tirkiyê jî di heman rewşê de ye.
Erdogan tîpekeke mehkûmê destîhilatê ye. Êdî ni rewşeke asayî de nikare li ser piyan bimîne. Xerabiyên kirîn, hilweşîna kirî dorpêç kirine. Di encama vê dorpêçê de Bahçeli li ser serê wî kirin qeyûm. Li Tirkiyê du kesên herî faşîst, herî nijadperest, qirker û militarîst anîne cem hev. Erdogan bi spartina van hêzan û bi domandina şer li ser destîhilatê dimîne. Ji ber wê ev hikumet, hikumeta şer û qirkirinê ye. Di hedefa vî şerî û qirkirinê de jî Kurd hene.
Li Tirkiyê partiyên siyasetê dikin, rewşenbîr û hêzên demokrasiyê divê li gorî vê rastiyê tev bigerin. Kesên Erdogan ji Hîtler cuda bibînin wê xwe bixapînin û bedelên girantir bidin. Dema Erdogan di pîpelkên destîhilatê de ber bi jor ve diçû, ti kesî texmîn nedikir ku Tirkiye were vê rewşeê. Yên têkildarî siyasetê û piraniya rewşenbîran bi awayekî Erdogan heq nekirî destek danê. Qaşo wê li Tirkiyê reform bên kirin, bikeve YE û pirsgirêka kurdî çareser bibe. Lê her ku Erdogan dewlet xist destê xwe tiştên erênî li aliyekî, di destê de çi hebe ew jî hin bi hin ji holê rakirin.
Çawa ku tê dîtin Erdogan weke Hîtler gotin, qanûn tev ji bo bihêzbûna xwe bi kar anîn û xistin xizgema şer. Çavkaniyê Tirkiyê tev, piştgiriya derve bi vê armancê bi kar anîn. Bi navê sîstema Serokkomariyê hêz tev li cem Erdogan kom bû. Weke li cem Hîtler kom bûyî. Û ji sala 2015an ve bênavber û bi berfirehî lez û hêz da şer. Şerê cîhanê yê 2. çar salan ajot. Lê yê Erdogan derbas bû. Em salên pêşî û amadekariyê hesab nakin.
Ji bo diyarkirina xerabiyên Erdogan kirîn gotarek têrê nake. Ji bo wê piştî niha em li tiştên ku divê bên kirin binêrin baştir e. Lewre tiştên heta niha hatîn kirin nîşana kiryarên piştî niha ne jî. Mixabin hê yên ev rewş baş fêm nekirîn yan naxwazin fêm bikin hene. Weke hênên hember yên di dema Hîtler de. Di dawiyê de tev hatin tinekirin.
Krîza navneteweyî ya berî şerê cîhanê yê 2. û hişmendiya dewletên Ewropa ya berjewendiyê ji Hîtler xwedî kirin. Hîtler ji van nakokiyan baş sûd girt. Sîstema dinyayê ya niha jî di krîzeke giran de ye. Hevsengiyên di dema şerê cîhanê yê 2. de nemane lê yên nû jî ava nebûne. Hişmendiya Emerîka, Rûsya û Ewropa ya berjewendiyê, nakokiyên di navbera wan de ji Erdogan re qada tevgerê vedike. Dewleta Kurdan û dewletbûnê sûdê digire. Weke din endama NATO ye. Tê gotin hevalbenda Emerîka ya stratejîk e. Iraq û Sûriya roxiyane, lewaz bûne. Îran di binê ambargoyê de ye. Weke din pirsgirêka kurdî ya van dewletan jî heye. Her kesê li dijî Kurdan, Tirkiye amade ye her rengê itifaqê bike. Ji hevalbendên wan nînin. Tirkiye ji dewletbûnê sûdê digire. Weke din endama NATO ye. Tê gotin hevalbenda Emerîka ya stratejîk e. Iraq û Sûriya roxiyane, lewaz bûne. Îran di binê ambargoyê de ye. Weke din pirsgirêka kurdî ya van dewletan jî heye. Her kesê li dijî Kurdan, Tirkiye amade ye her rengê itifaqê bike. Ji dijminiya Kurdan re rêbertiyê dike. Di vê mijarê de wan jî dixe tevgerê. Ji ber ku PKK xistine lîsteya terorîzmê Tirkiye pir bextiyar e. Bi dehê salan e bi destê Emerîka hereketa Kurdan ya herî mezin bi terorîzmê demxe kirine. Bêguman ev awantajeke mezin dide Tirkiyê û zemînê domandina şer û zemînê şer pêk tîne. Bi ser Emerîka de diçe ku YPGê jî ku bi Koalisyona Emerîka pêşengiya wê dike re DAIŞ şakand, bixe nava lîsteya terorîzmê. Dibêje YPG PKK ye û bi ser Emerîka û Ewropa de diçe. Dewleta tirkî di şerê psîkolojîk û qirkirinê de bûye hoste. Weke din di perwerdeya Emerîka de jî derbas bûye.
Sedemên faşîsteki weke Erdogan li Tirkiyê bûyî destîhilat, yek ji wan jî di serî de Emerîka durûtiya Ewropa û xwedîderneketina li nirxên demokrasiyê ye ku diparêzin.
Di nava sînorên Tirkiyê de bajar hatin roxandin. Nêzîkî sed şaredarî yên bi qanûnî hatîn bidestxistin destê danîn ser wan. Bi hezaran endam û rêveberên HDPê avêtin zindanan. Niha jimara Kurdên di zindanan de ji jimara di dema 12ê Îlonê de pirtir e. Emerîka û Ewropa van tevan dibînin. Digel van hêzên Rojavayî destek dan Erdogan, yan jî çavê xwe jê re girtin. Bi saya vê siyastê Erdogan bi hezaran çete li dora xwe kom kirin. Efrîn û Serê Kaniyê dagîr kirin. Bênavber başûrê Kurdistanê û Şingal bombebaran kir. Başûr dorpêç kiriye. Bi dehan baregehên leşkerî li wir ava kirine. Herî dawî 10ê Sibatê êrişî Garê kir. Dîlên xwe kuştin. Piştre jî PKK sûcdar kir. Ji ber ku Emerîka bi têrayî PKK sûcdar nekir wê jî deyndar derdixe. Herî dawî Erdogan got, emê serhildana Kurdan ya dawiyê bişkînin û bi ser bikevin. Tirkiye bi serê xwe nikare vê bike. Ne ji Emerîka be nikare êrişî Iraqê jî bike. Dixwaze jê re bê grişî, Qeheremanê Kurd tine kirîn û bi wî awayî bikeve dîrokê. Bêguman bi destека Emerîka û Ewopa